


Rapora Projeya Lêkolînê ya „Berhevanîna Tevgerên Jinan a li Nav Tirkîyê“

I. Nivîsa Destpêkê ya Rêveber û Weşangera Rapora Lêkolînê ya „Berhevanîna Tevgerên Jinan a li Nav Tirkîyê“: Têbiniyên destpêkê yên di derbarê şert û mercên sîyasî û bandorên wan ên li ser pêvajoya lêkolînê

Yasemin Karakaşoğlu

Îlon 2017



I. Nivîsa Destpêkê ya Rêveber û Weşangera Rapora Lêkolînê ya „Berhevanîna Tevgerên Jinan a li Nav Tirkiyê“: Têbiniyên destpêkê yên di derbarê şert û mercên siyasî û bandorên wan ên li ser pêvajoya lêkolînê

Projeyeke lêkolînê ku li du fenomeneke protestoyên civakî yên li Tirkiyê, wek tevgerên jinan be û ev fenomen bi buyerên siyasî yên wek Protestoyên Geziyê (2013) û hewldana darbeyê (2016) hatibe çarçove kirin, divê ev „çarçove“ bi awayekî vekirî bê destgirtin. Wekî mantiqa projeyên dibistanên bilind ên ji kesên sêyemîn ve tîne fînanse kirin, bi dawîbûna vê projeyê jî fînanmana wê û alavên binesaziya wê xelas bûn, koma projeyê belav bû û bi projeyên nû ve hatin girêdan. Daneyên esasî yên vê projeyê ku binyata encamên lêkolînê ne, di navbera 2014 û 2015 de hatin berhev kirin, hevpeyvîner tecrubeyên Protestoyên-Geziyê hin nû li dû xwe hiştibûn û (bê guman bêyî hezr kirin) serpêhatiyên bi êş ên şeva hewldanên darbeyê û rewşa awarte ya hin bi bandortir û bêhedartir û herweha biryarnameyên di hukmê qanûnê de hin li pêş wan bûn.

Wekî din ji ber mudaxeleyên leşkerî yên dema pêvajoya projeyê û rewşa wek şer bi taybetî li heremên başurrohhilatê Tirkiyê ku bi giranî Kurd lê dijîn, bandorê li ser xebatên me jî kirin û ji ber vê sedemê lêkolînên me yên li heremê bi Diyarbekirê ve sînorkirî man. Lewre ewlehiya xebatkarên me (êdî) wekî din nikaribû bê parastin. Herweha ji heman sedemê hin hevpeyvînerên bi berpirsiyarên Tevgera Jinên Kurd re li heremên din ên Tirkiyê hatin çêkirin, heta hin hevpeyvîner nikaribûn bîne pêk anîn. Yek ji sedemên sînordarkirina mînakî girêdayî sînorkirina qada lêkolînê di hêla gihaştina hin aktor û rêxistinên Kurd û yên oldar û muhafizekar de derketin.

Wekî tîma projeyê me biryar da ku heta ji dest tê li ser rewşa bingeşê de bi awayekî vekirî (transparent) tevbigerin û bi vî awayî li ser projeya tê lêkolînkirin bixebitin. Di vê biryarê de daneyên ku beriya hewldana darbeyê hatin berhev kirin, wekî dema ku hatine hilgirtin nirxandin esas e, di bin şert û mercên lêkolînê de „rojane kirin“an jî „ji nû ve pirs kirin“a bi hevpeyvîner*an re, her çiqas bê guman pir bi wate û nirx be jî, ne gengaz e. Encamên bi vê raporê tîne pêşkeş kirin –li gorî îtîbar û derbasdariya daneyên lêkolînê çendanî û azmûnî – di bin mercên heyî de dê dîsa derketana holê? Em bawer nakin, lewre biryarên rojane, yên di

çarçoveya rewşa derasayî de tîn girtin – di vê de girtina komeleyan û navendên jin û zayenda civakî û rawestandina finansmanên wan – bê guman bandorê li ser têgihiştina rêxistinên, têşeyên û çapên wan, piştgirî û cudatîyên wan jî dike. Parçebuyîna civakê ya di referanduma 11 Nîsan 2016’an de bi awayekî aşkere derket holê, şikandinên kûr ên di navbera aktor*ên civakî ango herweha yên sîyasî yên jin de ku di nava hevpeyvînan de jî tê dîtin, şikandinekê çêkir.

Ji ber van sedeman encamên lêkolînê yên ku neha li vir tîn pêşkêş kirin, gelo ne derbasdar in? – Li gorî girêdayibûna dîzayna wesfî-azmûnî ya di navbera rêbazên nîrxandin û şopandinê yên zanistên civakî û çandî– em dikarin bi awayekî vekirî bêjin na. Zanist nikare xwe bixe bin bandorên ku bi daxwazên rojane yên ji hêla medyayê ve tîn ferz kirin. Ev di derbarê pêgirtina pêvajoyên dîrokî û nîrxandinên derbarê pêkhatinên wan de ye. Di vê çarçoveyê de ji ber ku xwedî wateyekî dîrokî ye, nasîna têşeyên gotin û çalakî, mijar, aktor* û koalîsyonên di navbera salên herdu pêvajoyên sîyasî de qewimîne wek girdok (mercek) li ser pêvajoyê girtin, esasî ye.

Em di wê baweriyê de ne ku lêkolîna zanistî ya di derbarê mijarên sîyasî yên zayendî di bin şert û mercên sîyasî yên rojane li Tirkiyê ji herdemî zedetir pêwîst e. Ji xeynî rastiyên din, meşa şevê ya femînîst a Adara 2017’an bi tevîbûna 40 000 kesî¹, vê rastiyê dide der.

Qada lêkolîna me ya azmûnî bi çi rengî ji hêla biryarên sîyasî yên rojane, bi guhartinên hêzî û tundî re rû bi rû maye, di qedexekirina komeleyên li jêr hatine rêzkirin û rêveberiyên wan de xwe nîşan dide.² Ji bo me van komeleyan bi awayekî aşkere bi nav kirin, berpîrsiyariyeke etîk e:

- Navenda Lêkolînê ya Jinê Anka, Ankara (Anka Kadın Araştırma Merkezi) Ankara
- Ajansa Nûçeyan a Jînê, Diyarbakir (Jîn Haber Ajansı)
- Komeleya Jinan a Destên bi Hine, Diyarbakir (Kımalı Eller Kadın Derneği)
- Kongreya Jinên Azad, Diyarbakir
- Komeleya Jinê Selîs, Diyarbakir (Selîs Kadın Derneği)

¹ Ev hejmar di gelek rojnameyan de hat nivîsandin, wek mînak: <http://t24.com.tr/yazarlar/dilara-gurcu/taksimde-40-bin-kadin-8-mart-feminist-gece-yuruyusunu-duzenleyen-kadinlar-anlatiyor,16800>.

² <http://tr.boell.org/de/die-frauenbewegung-der-tuerkei-widerstand-aufstand-sieg>.

Li ser vê esasê em ji hemî muxatabên ji heremên hîlbijartî yê Tirkiyê ku bê fikare û bi giranî destûra bi navkirina navên xwe ji bo hevpeyvînan xwe amade nîşan dan, spas dikin. Nîşaneyêke din a di derbarê qada sîyasî ya bi gelek tansiyon ku em bi eleqe û encamên xwe yê lêkolînê tê de tevgeriyên, ev bû; ji ber rewşa derasayî hin hevpeyvîner nexwestin di nav raporê de navên wan bî dayîn. Ev daxwaz di pêvajoya berhevkirina daneyan de nehatibû bi lêv kirin. Bandorên rasterast ên darbeyê li ser projeyê di rastiya çarçoveyên biryarên sîyaseta zanîngehan de di bin bandora rewşa derasayî de derket holê. Şîrkên hevkarîyê yê Zanîngehên Stenbol û Enqerê neçarî teqawitîyê bûn û bi vî awayî têkilî û çavkaniyên sazî êdî ji bo me ne gengaz bûn.

Armanca Projeya Lêkolînê

Projeya ji hêla Weqfa Mercator ve di çarçoveya programa înterdîsîplîn „guhertina bergehê. Lêkolînên di derbarê Tirkiyeya Modern“ a bi navê „Berhevanîna Tevgerên Jinan a li Nav Tirkiyê“ pîrrengiya tevgerên jinan ên li heremên cuda yê Tirkiyê, ku bi çalakî û rêxistinên cuda xwe didin der û ji bo wekhevîya zayendan têdikoşin, analîz kir. Di lêkolînên wesfî de yê bi aktîvîst*ên tevgeran û akademîsyenan ve hatin kirin de mijar û çalakiyên tevgerên jinan, herweha rewşa karkirina jinan, siyasetên bedenê û şîdeta zayendî yê di qada transnasyonal, heremî û bajarî de tî nîqaş kirin, wek mijar hatin dest girtin.

Giringiya lêkolînê li ser polîtîkayên koalîsyon û nasnameyên tevgerên cuda yê jin û zayendî bû. Bi vî awayî diviyabû serdestiya lêkolînên di derbarê rêxistinên sîyasetên zayendî û jinê ku bi giranî li bajarên mezî ên Rojavayê Tirkiyê tî kirin, bê şikandin. Ji dêl lêkolînekê ku giraniyê dide kêmasiyê, – wek nîqaşên mexdûriyê yê li ser koçberên misilman ên ji Tirkiyê li medyaya Almanan – (Karakaşoğlu 2006; Steinbach & Cremer 2006), ev proje giraniya nîrxandinên xwe dide ser aktîvîte û mijarên tevgerên jinan, ku xwe wek rexnegirên civakî dinasînin, alternatîfan pêş dixînin û li gorî sekna xwe ya sîyasî aktîf wek alîgirê guhartinê dibînin.

Xala nîqaşên femînîst ên navnetewî bi nasandina cudatîyên di navbera kategoriya zayend de ji sala 1990’an vir de guherî ser pîrsên nasnamê û girêdayî vî seknên hêzî/desthilatî. Ji ber

pêvajoyên trans-netewbûn û globalbûnê, nûsazîkirinên neolîberal herweha nîqaşên derbarê siyasetên nasnameyî, lêkolînên zayendî yên navnetewî bi taybetî di civakên wek ,rojawayî' tên nasandin de ji salên 1990'î ve qala „krîza tevgera femînîst“ dikin (Schulz 2007: 8). Herweha li Tirkiyê piştî destwerdanên (mudaxele) rexneyî, bi taybetî yên aktîvîst*, femînîst* û komên Jinên Kurd û oldar-muhafezekar bi nasnameyên cuda bandor li ser tevgerên jinan kirin. Neha wek mînak komên ku xwe wek radîkal, lezbiyen, queer, trans*, sosyalist, oldar-muhafezekar, Kemalîst, dis/abled (astengdar), Kurd, Alewî û Ermenî pênase dikin, hene. Piştî jihevderxistina (Dekonstruktion) kirdeya kolektîf „em-jin“, ku di çarçoveya Tirkiyê de jî derbasdar e, hin jî ji ber sedemên cudakariya tevni û şîdeta li dijî jin*an bizava pirrengî û firsendên piştgiriye yên têkilîdanînê, herweha firsendên perwerde û koalîsyonan xwedî pirsgirêk in.³

Rewşa jinê, herweha têkiliyên zayendî û malbatî di deh salên derbasbuyê de „ne tenê guhertineke bi bahozi“ derbas kir, „herweha bi awayekî taybetî bi dubendiyên dramatik, newekhev, û nehemandembûnê ve rûbirû ma.“ (Kreile 2012, p.306) Bi taybetî piştî hikumetbuyîna AKP ya sala 2002'an têkiliya ol, siyaset û zayendê bi polîtîkayên neolîberal û muzakereyên têtetina Yekitiya Ewropayê (YE) ji nû ve hatin sazî kirin (Dedeoğlu & Elveren 2012). Tevgerên jinan wek bertekekî civakî li ser têkiliyên zayendî û malbatî herweha polîtîkayên li Tirkiyê, di nav lêkolînên Almanî yên di derbarê Tirkiyê de bi nêrîneke ji hev cudakirî nayên dest girtin.⁴

Li ser vê bingehe encamên projeya me ya lêkolînê gelek balê dikişînin. Lewre di hin nîqaşên zanistî yên di derbarê Tirkiyê de qala yek tevgereke wekhev tê kirin, ev tevger ji sînorên bîrdozî wêdetir mijarên hevpar digre dest, têkiliyên zayendî bi awayekî vekirî rexne dike û ligel vê rexneyeke civakî ya radîkal formule dike (vgl. Somersan 2011). Bi vî awayî tevgera jin (bi yekjimarî) di civaka sîvîl de wek aktoreke pêwîst û bi giranî li dijî AKP di rewşa opozîsyon de û ji bo guherîna civakî wek hêza motorê tê dîtin (Bundeszentrale für politische Bildung 2011, p. 48). Ger rêxistinên jinan ên oldar û muhafezekar wek beşeke tevgera jinan a oldar û

³ Ji hêla rexneyên teorîsyênên queer femînîst, postkolonyal û poststrukturalîst û herweha siyasetên nasnameyî yên tevgerên civakî yên nû kategoriya zayend a homojen, gerdûnî bi taybetî ji destpêka 1990'an vir de hat felişandin an jî ji navendê hat derxistin (Kerner 2007).

⁴ Wek mînak xalên lêkolînê yên navendên lêkolînên di derbarê Tirkiyê û Întegrasyonê yên Duisburg, Essenê de, di Navenda Tirkiye-Ewropa ya Zanîngeha Hamburgê de, di Saziya Rojhilat a li Stenbolê an jî saziya akademîk a *Network Turkey* de, herweha di weşanên Navenda ji bo Perwera Politik (BpB) a di derbarê Tirkiyê de têkiliyên zayendî bi têrî nayên dest girtin (2011, 2012).

muahfezekar bên dîtin (wekî ku em di çarçoveya projeya xwe ya lêkolînê de ji ber sedemên xwe sînorkirinên rêxistinên jinan ên oldar-muhafezekar û laîk bi vî awayî digirin dest) êdî xwe ji AKP sînorkirin wek nîşaneyê yekkirina tevgerên jinan ên Tirkiyê nîkare bê dîtin. Ji bo hewldanên xwe sînorkirinê yên bi vî awayî û yên din, û herweha hevalbendiyên navbera aktor*ên siyasî yên jin û zayendî ku xwediyên bîrdoziyên cuda ne, li hereman bê lêkolîn kirin, di lêkolînên wesfî û azmûni de polîtîkayên koalîsyonê û nasnameyî yên aktor*ên jin û zayenda civakî li bajarên mezin Enqere û Diyarbekirê, herweha li bajarên piçûk ên Egeyê (Muğla und Denizli) û li Deryaya Reş (Trabzon, Artvin û Hopa) bi awaya berhevdanê hatin lêkolîn kirin. Daneyên li gorî berhevkirina materyalan, şopandinên qadê û hevpeyvînên pispor*an hatin nirxandin di derbarê bandorên cuda yên civakî-aborî û çarçoveyên siyasî yên li ser mijar û xwe pênasekirina tevgerên jinan ên heremî (bi pirjimarî) de agahiyên didin. Ligel vê pêvajoyên trans-netewî, netewî û torên heremî jî li gor giraniya xwe hatin berçav girtin. Ji ber sedemên pragmatîst ên lêkolînê yên wek demî û aborî tevgerên jin ên cuda yên hindikahiyên etnîk û olî yên wek Alevî*, Cihû* an jî Ermenî* mixabîn – herçiqaş lêkolînkirina wan bê guman ji bo pirsê me ya lêkolînê encamên gelek pêwîst bida dest jî – nikaribûn bên hesabandin.

Di pêvajoya berhevkirina daneyan de herweha di analîzkirina wan de pirsên li jêr ji bo lêkolîna me rêzaniyê kirin:

- Kîjan mijar, qadên çalakiyê, stratejî, amûrên têkilîdanîne û qadên tevgerê ji bo tevgerên jinan ên li Tirkiyê xwedî hêza bitevgerkirinê (mobilisation) ne?
- Kîjan pênaseyên femînîzme, tevgerên jin(an) û zayendê tîk bikaranîn? Kategoriya „Jin-bûn’ê îro ji bo tevger(ên) civakî hin jî wek xaleke hûrbûnê dikare bê dîtin?
- Aktor*ên jin û zayenda civakî di çi radeyê de bi alîkariya kategoriya „Jin-bûn’ê xwe di qadên lêkolînê de bi rêxistin dikin? Rêxistinên tevgerê bi perspektîfeke hevbirîn (intersectional) xwe pênase dikin? Pirçandî di çi radeyê de ji hêla tevgerên jinan ve tê pêjirandin û wek mînak bi riya xistina mijarê an jî wek stratejî tîk bikaranîn, an na? Girêdayî vê wateya siyaseta nasnameyê çi ye û kîjan siyasatên koalîsyonê tîk birêxistin kirin an jî nayên birêxistin kirin?
- Kîjan hevbeşî û cudatîyên tevgerên jinan girêdayî bajarên mezin û piçûk derdikevin holê? Di kîjan radeyê de navendên tevgeran ên navendî û ne navendî dikaribûn bên

nasandin?

Encamên lêkolînê yên navendî û hin pêdiviyên lêkolînê

Encamên lêkolînê, yên navendî ku li jêr bi awayekî kurt wek têt hatine rêz kirin ji hêla endamên tîma lêkolînê ve bi nivîsên cuda û kesayetî yek bi yek bi berfirehî têt dest girtin û nîqaş kirin.

- Tevgerên jinan bi mijarên xwe û têtşeyên xwe yên çalakiyê di pirrengiyên xwe yên nasnameyî de li Tirkiyê di nav tevgerên civakî yên muxalîf de roleke navendî û dînamîk dilîzin.
- Bi riya perspektîfeke hevbirînî û bi awayekî teorîk dikare bê gotin ku, tevgerên jinan ên li Tirkiyê li gorî bicîhkirinên xwe yên heremî, netewî û trans-netewî wek tevgerên civakî dikarin bêt pênase kirin.
- Encamên azmûnî nîşan didin ku tevgerên jinan bi pirjimarî bilêv kirin di cîh de ye, lewre cudahiyan siyasî-bîrdozî (ji femînîsta radikal heta oldar-muhafezekar), herweha bicîhkirinên heremî yên li Tirkiyê (Navend, Başûrrojhat, Başûrojawa, Bakurrojhat) di li ser kûrbûna hin mijaran de (wek mînak: Hawirdor an jî xwebirêvebirina etnîk), di pêkanîna hin têtşeyên çalakiyan de (wek mînak: Protestoyên li kolanan an jî li salonan) herweha di mijara derfetên koalîsyonan de roleke pêwîst dilîzin. Mijarên gengeşiyê, bi taybetî di nîqaşên derbarê etnîsîte, oldarî/muhafezekarî, têtîliya cinsî/zayendî/meyla zayendî herweha di têtşeyên rêxistinbuyinê yên gorî armancên siyasî de derdikevin holê û girêdayî vê di derbarê hevkarî*yan koalîsyonê de nîqaş têt kirin. Herweha pirsên wek divê rêxistinên jinan mêran wek hevkarên koalîsyonê bipejirînin, an jî ger piştigirya dewletê bê pejirandin, di kîjan astê de xwesarî di naverok û têtşeyên çalakiyan de divê bê parastin, mijarên ku di nav tevgerên jinan ên cuda de têt nîqaşkirin in. Bi awayekî vekirî mijarên wek etnîsîte, têtîliya cinsî/zayendî/meyla zayendî, bîrdoziya siyasî an jî nasnameya oldar wek xalên ji hev cihê dikin an jî bi dikin yek, ji hêla pisporan ve hatin nîqaş kirin. Li gel vê wek kategoriyeke cudahiye pola (*class*) civakî herweha *age/nifş* nehat dest girtin.
- Di vê çarçoveyê de çavdêriya derbarê lêkolînerên jin û zayendî yên li zaningehan

dixebitin de nîşan dide ku akademisyen – li ser herêm û nifşan – di navbera nasnameya xwe ya akademîsyen û aktîvîst de cudatî danaynin, herweha xebata xwe ya akademîk wek piştgiriyeke ji bo bihêzkirina tevger(ên) jinan dibînin.

- Di qadên lêkolînê de di navbera dema lêkolînê de (2014-2016) tev tevî hev dozdeh koalîsyonên jinan, ku tevgerên heterojen, girseyên armanckirî an jî jê zedetir di nav xwe de dihewînin, dikaribûn bînin tespît kirin Ev nîşan dide ku kategoriya zayend, di çarçoveya rexneyên poststrukturalist, postkolonyal û queer-femînîst di nîqaşên aktîvîst û zanîstên Tirkiyê de – di çarçoveya hin mijaran de – ji navendê dûr ketiye an jî ji hev hatiye derxistin (dekonstruktion) û hin jî ji bo tevgerên civakî yê li Tirkiyê wek xala hûrbûne tê dîtîn.
- Ligel cudahiya siyasî-bîrdozî yê di navbera tevgerên jinan de mijarên wek şîdeta zayendî, siyaseta bedenê, „bûkên zarok“, mafên jinan, perwerde û karên jinan, herweha tevlibûna siyasî ya jinan mijarên navendî yê hevpar in. Herweha di derbarê roja jinan a navnetewî 8'ê Adarê de, an jî daxwazên derbarê UN-CEDAWê de navbera aktor*an de koalîsyonên demborî tînin ava kirin.

Yek ji mijarên lêkolînê ku pêdivî pê heye, bandora rewşên civakî-aborî, herweha dîrokî-siyasî ya li ser tevgerên jinan a li Tirkiyê ye. Girêdayî vê mijarên wek wateya buyerên siyasi ji bo tevgerên jinan, rola medyaya civakî li ser politikayên koalîsyonê yê di navbera tevgerên jinan, an jî rola taybet a Stenbolê ji bo aktîvîzma jin û zayenda civakî li hemî heremên Tirkiyê, dikarin bînin lêkolîn kirin û nasandin.

Têşeya weşanê û di derbarê zimanên hatine berçav girtin de

Me biryar da, emê rapora dawî di forma weşana online de biweşînin. Lewre em vê forma trans-netewî ya vekirî ji bo weşanê baş dibînin. Herweha ev biryar li armanca projeyê jî tê, lewre bi vî awayî pispore*ên tevli pêvajoya avakirina vê raporê bûne, herweha kesên eleqedar dikarin encamên lêkolînê bi awayekî hêsanî bi dest bixin.

Nivîsên di vê raporê de, an jî hêla kesekê ve an jî wek kom hatine nivîsandin, hin xalên encamên lêkolînê wek gotar didin der. Ev rapor ji hêla rêvebera projeyê Yasemin Karakaşoğlu

ve tê birêvebirin û weşandin. Ew berpirsiyariya bingegehî a hevgerêdana naverokê ya navbera nivîsan digre ser xwe. Herweha hemî nivîsên ji hêla xebatkarên vê projeyê ve di bin berpirsiyariya wan de hatine nivîsandin, di nava xwe de mijarên bi encam bûne digirin dest û bi vî awayî ji hev û din cuda xwendinê armanc digirin. Li ser esasa etîka lêkolînê ku aktor*an navend distînin, ji bo me vê raporê bi zimanên hevpeyvîneran weşandin gelek pêwîst e. Lewre projeyekê ku di xeta navbera zanist û tevgera civakî de cihê xwe digire, divê berpirsiyariya parvekirina encamên xwe li qada ku jê tê bigire ser milê xwe. Bi vî awayî dikare li ser van encaman bê xebitandin, bê nîqaş kirin. Ev hişmendiya lêkolîna femînîst a beşdar dide der. Ev rapor ji ber vê yekê ji bilî Almanî û Îngîlîzî ku di çarçoveya Almaniyayê de wek zimanên zanistî tînin pejirandin, bi zimanên Tirkî û Kurdî ji wek zimanên navendî yê qadê hatin wergerandin. Bi vî awayî em dixwazin encamên lêkolînê ne tenê bi nîqaşên akademîk bi sînor bikin, herweha em dixwazin derfetê bidin aktor*ên rêxistinên qadê, ku karibin encamên me binirxînin û rexne bikin.

Têşeya weşana online, ku nivîsên serbixwe hatine nivîsandin bi awayekî elektronîk dicivîne hevdû, derfetê dide xwendevan*an ku mijarên bala wan dikişîne ji bo xwe hilbijirînin.

Mijar di sê beşan de tînin dest girtin: (1) Têgeh, (2) Pênase û analîzên tevgerên jinan û (3) derfetên wan ên koalîsyonan. Gotarên di bin van têgehên de hatine nivîsandinê mijarên wek (1a) têgihîştina „Jin-bûnê ya li qadê (1b) bi pêşniyarên pispor*an ên di derbarê pênasekirina tevger(ên) jinan (ên femînîst) bi yekjimarî û pirjimarî, digirin dest. Herweha gotara (2a) dîmenên tevgerên jinan ên di hereman de hene, destnîşan dike. (2b) Dîsa Tevgera Jina Kurd wek aktoreke giring, – li gorî helwesta siyasî, an wek mînak an jî dijmînak – tê dest girtin. Di dawiyê de (3a) xalên tevgerên jinan ji hev cihê dikin an jî dikin yek, û (3b) koalîsyonên jinan ên li heremên cuda di raporê de cihê xwe digirin.⁵

Gotara Betül Yarar di dawiya weşana-online de cihê xwe digire. Ev gotar di bingeha xwe de beşeke projeya lêkolînê nîn e; Betül Yarar vê gotara vekirinê di çarçoveya „building bridges – atolyeya tordanîne ya siyasî jinan û zayenda civakî yê li Tirkiyê û Almaniyayê“ ku 1. Cotmeh

⁵ Di pêveka vê raporê de pirsên hevpeyvîne, kesên ku hevpeyvîne dane, nexşeya her çar qadên lêkolînê û rêzanê hevpeyvînan dikarin bînin dîtin. Herweha kronolojiya siyasî jinan û zayendî yê dema Osmanîyan û Komara Tirkiyê de û jînenîgariya kesên di amadekirina vê raporê de keda wan derbas buye, wek pêvek di raporê de cihê xwe digirin.

2016'an li Bremenê hat çê kirin de amade kir. Ji ber ku ev nivîs bi nirxandinên xwe yê derbarê niqaşên jin û zayenda civakî û derfetên siyasî û herweha pêvajoyên guhertinê yê civakî de nêrînên girêdayî projeya me digire dest, em vê gotarê ji bo encamên lêkolîna me wek tevkariyeke teorîk û analîtîk pêwîst dibînin.

Ev weşana me ya online yek ji gelek weşanên me yê ku me di çarçoveya encamên lêkolînê de pêşkêş kirine, ye. Di pêvajoya projeyê de bi gelek awayan nivîs, pêşkeşiyên derbarê projeyê de yê li konferansan, di çarçoveya 8'ê Adarê de daxuyaniya çapemeniyê, dersên li zanîngehê û daxuyaniyên encamên lêkolînê hatin dayîn. Bi vî awayî encamên lêkolînê bi raya giştî ve hatin parve kirin. Ji bo amadekirina rapora dawî niqaşên rexneyî yê akademîsyen*, aktîvîst* û pispor*an yê di derbarê dizayna lêkolînê, herweha encamên lêkolînê de ku di çarçoveya atolyeyên li Zanîngehên Bremenê (di destpêk û dayiya projeyê) Enqerê û Stenbolê (Gulan 2016) hatin li darxistin de, anîn ziman gelek pêwîst û giring bûn.

Spasî

Di vê xalê de wek weşanger ji xebatkar*ên zanistî yê projeyê ji Dr. Charlotte Binder, Aslı Polatdemir û –wek alîgira tîma projeyê– bursdara doktorayê Münevver Azizoğlu Bazan re ji bo alîkariya wan a mezin a di bin şert û mercên giran – ên wek rewşa jeopolîtîk û gengeşîya ziman – spasî dikim. Xebata bi wan re ne tenê profesyonel bû, herweha ji hêla wateya mirovî de desketiyeke mezin bû.

Dîsa ji bo koordînasyona weşana online ji İkbal Gerçik û Aslı Polatdemir re spasiyên xwe pêşkêş dikim. Herweha ji kesên ku rapora projeyê wergerandine zimanên cuda û di xebatên redaksiyonê de keda wan derbas bûne re, ji İkbal Gercik, Mehmet û Münevver Azizoğlu Bazan, Aslı Polatdemir, Jennifer Blundell, Doç. Dr. Yasemin Özgün û Candan Yıldız re, herweha ji Işık İzge Baran Güzelgün, Candan Öztürk, İnci Gerçik re spasî dikim.

Spasiya min a taybet ji herdu hevkarên me – ji bo Prof. Dr. Alev Özkazanç û Doç. Dr. Sevgi Uçan Çubukçu – re ye. Herdu zanist di hemî pêvajoya lêkolînê de bi zanî û pêşniyarên xwe yê gelek pêwîst, herweha bi organîzekirina atolyeyan, bi akademîsyên(en ciwan) ên li

zanîngehên xwe (yên berê) re, alikariyeke mezin dan projeya me.

Bettina Emir a ji Weqfa Mercatorê ji bo hevahengiya empatîk, bi dilsoz û berpirsiyarî ya di çarçoveya programa „Guhertina bergehê. Lêkolînên di derbarê Tirkiyeya modern de“ spasiyê heq dike.

Di dawiyê de em dixwazin ji Weqfa Mercator re spasiyên xwe pêşkêş bikin. Lewre bi destekdayîna xwe ya lêkolînên derbarên Tirkiyê de, ku di navendên lêkolînên yên rûniştî de bi giranî tîna meşandin, mebesta ji bo vê projeyê serlêdanê di me de hişyar kir.

Çavkani

- Bundeszentrale für politische Bildung. 2012. „Türkei.“ Informationen zur politischen Bildung. <http://www.bpb.de/izpb/77027/tuerkei> (03.12.2014).
- Dedeoğlu, Saniye, and Adem Y. Elveren, editors. 2012. Gender and Society in Turkey: The Impact of neoliberal Policies, political Islam and EU Accession. London, New York: IB Tauris.
- Karakaşoğlu, Yasemin. 2006. „Lebensrealitäten von Mädchen mit Migrationshintergrund – jenseits von Zwangsverheiratung und Ehrenmorden – Zentrale Ergebnisse der Studie ‚Viele Welten Leben‘.“ p. 22-26, di nav: Zeitschrift für Ausländerrecht und Ausländerpolitik, 26.
- Kerner, Ina. 2007. „Konstruktion und Dekonstruktion von Geschlecht. Perspektiven für einen neuen Feminismus.“ http://www.fu-berlin.de/sites/gpo/pol_theorie/Zeitgenoessische_ansaetze/KernerKonstruktion_und_Dekonstruktion/index.html (29.08.2014).
- Kreile, Renate. 2012. „Auf dem Weg in eine post-patriarchale Gesellschaft? Frauen und Familie.“ Pp. 306–17, di nav: Länderbericht Türkei, edited by U. Steinbach. Bonn: Bundeszentrale für politische Bildung.
- Schulz, Ulrike. 2007. „Feminismus zwischen Identitätspolitik und Geschlechterkonstruktionen. Gibt es einen Raum für internationale feministische Solidarität?“ http://web.fu-berlin.de/gpo/pdf/tagungen/ulrike_schultz.pdf (26.06.2014).
- Somersan, Bihter. 2011. Feminismus in der Türkei: Die Geschichte und Analyse eines Widerstands gegen hegemoniale Männlichkeit. Münster: Westfälisches Dampfboot.
- Steinbach, Udo and Stefan Cremer. 2006. „Die Türkei in der EU. Heftiger Ausschlag des Stimmungsbarometers.“ <http://www.bpb.de/internationales/europa/tuerkei-und-eu/52354/heftiger-ausschlag-des-stimmungsbarometers> (31.08.2014).
- Steinbach, Udo, editor. 2012. Länderbericht Türkei. Bonn: Bundeszentrale für politische Bildung.